

Kesê destê lêdanê hebe vir ne cîyê wî/wê ye!

Herkesekê maf heye ku bê şidet bijî.

„Her mirovek xwedîyê leşê xwe ye û azadiya mirovan nayê jê standin.“

Makezagon benda 2, xala 2



Bi gotinek dî:

- mafê gotina ne – heta di jîyan jinûmêr bûnê da,
- mafê vê ku ji alîyê hevjinê xwe û her mirovek dî rêz ji we bê girtin û ji we baldar bin,
- mafê weqetîn ji hevjinê/ê xwe.

Gelo hûn û yan kesek ji xizmên we ji alîyê hevjinê/ê xwe rastî şidetê hatîye?

Gelo hevjinê/ê we yan kesek dî

- hûn bêrêz kirine yan berçavê hewalan hûn şikandine?
- nahêle hûn serdana hewal û malbata xwe biken?
- nahêle hûn ji malê derkevin?
- mijarên we yê malî kontrol dike?
- bê hecet nerihet dibe û xwe kontrol nake?
- zirarê digehîne tiştên we?
- we ditirsîne ji genadina zîyanê ser zarrokan, xizman, hewalan, ajelên ahlî û yan ser xwe?
- li we dixê yan we digeze?

Agadarî bo qorbanîyên şidetên malbatî

- bi zordarî we mecbûrî têkilîya cinsî dike?
- Qebûl nake ku hûn weqetîyane yan dixwazin weqetin û we dişopîne, aciz dike û yan gefa ji we dixwe?

Eve nayê qebûl kirin!

Xwe sûçdar nezanin: Çi zagoneka izina metirsî dan û aciz kirina hevjin û zarrîkan nade. Berpîrsî tenê ser milê kesê şidetkere, ne we.

Mafê xwe bikar bînin bo Parastina zagonî.

Zagona parastinê we li hemberî şideta hevjin/a/ê we diparêze.

- Bi daxwaza we dozger dikare kesê şidetkar nêzî şeş mehan ji mala we ya hevbeş dûr bêxe. Tevî ku ev kese xwedîyê malê yan kîrê gîrê malê be.
- Ev zagone heta we li derweyê malê jî li hember zîrrar û acizbûnê diparêze. Dadgeh Dîkarin kesê sûçdar mecbûr biken ku bê izina we nêzî we nebe, gel we pêwendîyê negire, û hwd.

Agadarî bo qorbanîyên şidetên malbatî



Di rewşê acil da hûnê çî biken?

- Eger hevjin yan kesek di ji xizmê we hûn aciz kirin gel polîsî pêwendîyê bigire: **110** – Polîs dibe we biparêze û hûn dikarin herîzêde heta 14 rojan kesê şidetkar ji mala xwe derxînin (derxistin ji malê).
- Eger di mala xwe da hesta ewle bûnê nakin û ditirsin û yan pêdivîya we bi parastina taybet heye, gel mala xaniman pêwendîyê bigire. Hûn û zarrokê we tê livir bêne parastin.
- Hertim ji bijîşkê xwe bixwazin ku birrînê we qeyd û tomar bike.
- Tora ProBeweis derfeta qeydkirina deqîqa birrînan bo pêşkêş kirina wan ji dadgehê û qeydkirina belgeyan dabîn dike. Bo wî karî dikarin serdana zanîngeha Hannover yan Oldenburg yan kilînikê di yê alîyê girêbestê biken. Encamê lêkolînên bijîşkî li bin zagona nehênî mana bijîşkî da ne û tenê pê daxwaz we ya nivîskî tê ji polîs yan dozgerîyê re bê pêşkêş kirin. Agahîyên bêtir di: www.mh-hannover.de/probeweis.html

Agadarî bo qorbanîyên şidetên malbatî

Agahîyên bêtir dikarin bi rêya telefonê ji 0511/532-5533 (Acila Hannover) û 0176/1532 4572 (Acila Oldenburg) bipirsin.

- Li dema ku hûn bin metirsîya şidetê da ne û herîzêde paş rastî şidetê hatinê, tevahîya belgeyên giring kom biken, diravê neqîd rakin- bo amadebûna bazdana gengazî- û wan di cîyek ewle da weşêrin.

Ku we diparêze?

Nesekinin daku zirarrek cidî bigehîşe we, şidet zêdetir dibe. Bilez Daxwaza alîkarîyê biken:

- **Malên xaniman, navendên rabêjê, telefonên acil***
- **hewal, xizm, cîran**
- **parêzer yan navenda rabêja hiqûqî**
- **nivîsingehê alîkarîya qorbanîya di nêzî we.**

Dema hewal, cîran û xizmên we rastî şidetê tên dibe hûn çi biken?

Bê xem derbas nebin!

Heta hûn bikarin alîkarîya xwe pêşniyar biken. Sebir biken. Mijarên jêr berçav bigirin: Axaftina ser acizbûnê û şidetê ne hêsane. Xwe dane cihê ew kesî.

* Jimare telefonan dikarin di rojnameyên heremî (bi giştî di beşa jimareyên acil da) û yan di tînvîsa telefonê da çend jimare bi navê „Xanim alîkarîya xanima diken“).